# Hînbûna Zimanê Almanî li Schleswig-Holsteinê

## Erstorientierungskurs (EOK)

## Starterpaket für Flüchtlinge (STAFF)

Tu li kûrsên EOK ûSTAFF da wek bernameya seretayî û nasyarkirinê, Zimanê Almanî hîn dibî û li ser mijarên giring ên rojane û pêkvejiyana li Almanyayê diaxivî.

Tu di rewşekê da rêpêdayî yî wek penaber an koçberê mezin ê xwedî cihê jiyanê Schleswig- Holsteinê beşdarî vê kûrsê bibî ku (hîn) te derfeta derbaskirina kûrseke entegrasyonê tunebe.

- 300/400 yekeyên hînkirinê
- Asta zimanî ya armanc a A1, A2, A2-B1
- bi belaşî

## Integrationskurs

Kûrsa Entegrasyonê ya bernameya kûrsa hînkariyê di yekemayeta ji bo hînbûna Zimanê Almanî ye. Ev kûrs ji kûrseke hînkirina ziman û kûrseke nasyarkirinê (Orientierungskurs) pêk hatiye. Tu Zimanê Almanî bi asta zimanî ya armanc a B1 hîn dibî û li ser pergala mafzanî, çand, dîrok û pêkvejiyanêî li Almanyayê diaxivî.

Tu di rewşekê da rêpêdayî ji bo beşdariya di vê kûrsê da yî ku bi awayê qanûnî û (gengaz e) bi awayê hertimî li Almanyayê bimînî û nasyariya te ya têrê digel Zimanê Almanî tunebe (xwartir ji Asta B1).

- 600/900 yekeyên hînkirinê
- asta Zimanî ya armanc a B1
- bi awayê belaş (di bin şert û mercên taybet ev kûrsa hînkirinê belaş e).

## Berufssprachkurs

Kûrsên hînkirina zimanê şixulînê te digel hînkirina Zimanê Almanî yê têkildarî şixulînê ji bo cîhana kar amade dike.

Tu di rewşekê da dikarî beşdarî vê kûrsê bibî ku koçber, welatiyê Yekîtiya Ewropayê (YE) yan welatiyê Almanyayê yê bi raboriya koçberiyê bî û

- Hewcetiya te bi bidestxistina pisporiya zimanî ya zêdetir ji bo şixulînê hebe.
- Di lêgerîna kûrsa hînbûna kar, li dû kar an jî bêkar bî.
- Di halê hînbûnê, şixulînê yan jî di halê derbaskirina pêvajoya piştrastkirinê da bî.

- ji 100 heta 900 yekeyên hînkirinê
- asta zimkanî ya armanc a gengaz a A2 heta C2
- bi giştî belaş




## Ezmûnên Zimanê Almanî

A1, A2, A2-B1, B1, B2, C1, C2 ji bo kesên ku bixwe lêçûnê didin

## Einbürgerungstest

Navenda ezmûnê ya Landesverband der Volkshochschulen Schleswig-Holsteins e.V. têkildarî demên serlêdan û tomarkirinê te haydar dike.

**Zanyariyên zêdetir têkildarî Mijaran li Peydakera kûrsa Zimanê Almanî (Deutschkursfinder) dibînî. www.deutschkurs-sh.de/deutschlernen**

Deutschkursfinder Schleswig-Holstein

Schleswig-Holstein
Ministerium für Soziales, Jugend, Familie, Senioren, Integration und Gleichstellung